ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 221

**Nûrî Birîfkî e'sle ew**

Ya reb, bi 'heqqê 'Siddîqî, bi nûra qelbê refîqî
Xaric bikey vî 'xerîqî, ji bîm û xewf û 'zeyqetê

Ew Ebû Bekirê 'e'zîme, 'sedîqê nebî kerîme
Ya reb, ez mûştaqî wîme, me'hrûm nekey me j'mînnetê

Ya reb bi 'heqqê 'Umer key, bi Farûqê mu'teher key
Me j'nûra wî bê behre nekîey, ewî bibînîn axretê

Ya reb bi 'heqqê 'Usman key, pûr 'heyaû pûr îman key
Bi nûra 'erd û 'esman key, serfiraz bîn b'şehadetê

Ya reb bi 'heqqê 'Elî key, bi mewlûdekê welî key
Bi sîneyê muncelî key, be'hra 'ulûm û 'hîkmetê

Ya reb bi ismê e'i'zem key, bi E'hmedê mukerrem key
Bi Mûsayû bi Adem key, qibûl bikey vê de'wetê

Ya reb bi navê Celîl key, bi Îbrahîmê Xelîl key
Bi Nu'h û rebbî Cubrîl key, bi 'Îsay û milyaketê

Ya reb bi 'heqqê enbîyai, ya reb bi heqqê ewlîyai
Ya reb bi 'heqqê etqîyai, ya reb bi ehlê sunnetê

Ya reb bi 'heqqê Quranê, ya reb bi ehlê îmanê
B'melaîketêt 'esmanê, xalî nebin ji xilmetê

Ya reb bi her çar îmam key, bi şêx Cuneyd û Luham key
Bi Mu'hyeddînî temam key, Ebdûlqadir û zuryetê

Ya reb bi ’heqqê kursî key, bi nûra ’erş û kursî key
Bi heqqê cumle welî key, ya na’sirê her ne’sretê

Ya reb tu mu’în û be’sîrî, ya reb tu b’halê min xebîrî
Ya reb tu mûrada vî feqîrî, tu red ne key yêk sa’etê

Ya reb tu rebbê ’sebûrî, ew miskînê nav lê Nûrî
Tu b’xû settar û ’xefûrî, qet nebînit fe’za’hetê

Ya reb wê dayî û baba, çend birayû û e’hbaba
Hem eqrîba û es’haba, daxil bikey li cennetê

Ya reb bi alêt resûl key, bi e’s’habêt deh qubûl key
Vê du’ayê tu qubûl key, bû meû cemî’iê ûmmetê

Paşî (hizar û du’sedî çil kêm du) çûn j’vî ’ededî
Ji paşî dewra E’hmedî, ye’inî ji weqtê hîcretê

Bûrîn ew qeder sal û mah, lew keftime be’hra guna
Medet li ber dergahê şah, ya reb bidey se’adetê

’Talibê lu’tfê ’xefûrî, gûmrehî, rencî, Nûrî
Wê li nusxa wî bihurî, rojgara hîcretê

Ev Nûrîyê bîmare ew, bê mal û bê tîmare ew
Can dadeyê sîmare ew, cad û hîlala cebhetê

Cad û hîlala tûz û reş, zehra hîlala dane ceş
Mestê şerab û darê deş, mexmûre ev der we’hdetê

Nûrî Birîfkî e’slê ew, belkî ’Huseynî neslê ew
Tîra li dil da neslê ew, reştûzeka ji mekketê

Cem'a mu'hekkem çûn şewed, sal (heşt sîyê danzdeh 'sed)
Bûrîn bi vî resmî 'eded, ne'zm û beyana qî'setê.

---

**Refîq: heval, dûst, hawrê.**
**Bîm: tirs.**
**Xewf: tirs û xûf.**
**'Zeyîqet: bêntengî, diltengî.**
**Mûştaq: arezûmend.**
**'Heyai: şerm.**
**Sîneyê mûncelî: dilê pak û mezin, dilî pak û gewre.**
**Sîne: mebest li vir "dil"e.**
**Welî: mirûvê çak, mirûvê pak.**
**Na'sir: necatdar.**
**Mû'în: agedar.**
**Red: bêbeşkirin.**
**'Sebûr: bi taqet, bi sebir, be 'hew'sele.**
**Fe'za'het: hetkçûn.**
**E's'hab: heval, hawrê, dûst.**
**Cemî'i: tev, gişt, hemî, hemû.**
**Gûnah: guneh.**
**Se'adet: xûşî, keyfxûşî.**
**Gûmreh: sergêj, ser lê şêwaw.**
**Rojgar: dewran, dewr, zeman.**
**Bîmar: nexûş, nesax.**
**Tîmar: dermankirin.**
**Candade: şeyda, 'aşiq, bû ew mirdûwe.**
**Ceş: çêştin, tamkirin, t'emkirin, tamkirdin.**
**Mest: serxweş, serxûş.**
**Mexmûr: xûmar, serxûş.**
**Nesil: regez.**
**Sal heşt sîyê danzdeh 'sed: dike 1238 hicrî.**
**'Eded: hejmar, jimare.**
**Ne'zm: çêkirin, nivîsîn, amadekirin.**

**Ş'ira mûbarek** (*)

Ya reb tu 'xeffarê minî, bê şik tu settarê minî
El'heq sizawarê minî, derbabê fa'zl û mînnetê

Mînnet dehê ba her kesî, firyadresê her nakesî
Ustadê çerxa e'tlesî, neh lewleba dewranetê

Neh lewleba çerxa birîn, kêşane muddê hemçinîn
Hindî peristî lê meşîn, tazî li hindî nûbetê

Hîvî dikit Nûrî wereng, bişût bextê 'safî ji jeng
Dunya peristî camî beng, têket şeraba 'sefwatê

Ya xaliq û qeyyûm û heq, Nûrî tu lêkey pur şefeq
Mes'ûd bitin weqtê sebeq, ya reb tu lêkey re'hmetê

Nûn û waw ev înşakirî, rîwayetêt cemi'i kirî
Nis'het ji bûna sakirî, 'xafil nebin ji xilmetê

'Ebdê ku ev înşakirî, muşteqî Ebdûlqadirî
Mewlûd Birîfkan axirî, Îtûte sakin muddetê

'Ebdê ku nav lê Nûrîye, şî'ira mubarek gûtîye
Weqtê zeman lê bûrîye, dûr bû j'nebîyê ummetê

---

**Sizawar: layiq, laîq.**
**Mînnetdeh: mezin, gewre (xudanê minetkirinê).**
**Firyadres: were hawara me, pena bû dênim, bê behawarmew, firyadkewtin, nacî, necatder.**

**Çerxa etles: felek, gerdûn**
**Lewleb: dewran, zeman.**
**Hemçinîn: herwiha, herwisa.**
**Hindî peristî: ciwan peristî.**
**Wereng: bi vî rengî, bew renge, bi vî awayî, bew cûre.**
**Perist: sitayîşkirdin.**
**Beng: ’heşîşe.**
**Camê beng: serxweş, sergêj.**
**Şeraba ’sefwetê: şeraba xûşewîstîyê.**
**Şefeq: re’hmî, be naybe.**
**Mes’ûd: keyfxûşî.**
**Sebeq: rabûrî, rabirdû**
**Rîwayet: cêranewe, beyankirin.**
**Cemî’i kirî: kûmkirî, kûkirdî.**
**Sakir: serxweş, mebest li vir ”’xafil”e.**
**Mûştaq: arezûmend.**
**Mewlûd: ji dayîk bûyî, le dayîk bûwe.**
**Sakin: nîştecê, danîştûy ewê, ehlê ewê.**
**Mûddet: demek, maweyêk.**

(*) Xwendevanên hêja, di nav vê helbestêda Şêx Nûreddînê Birîfkanî bi xwe nîşan kirîye, ku ew li gundê Birîfkan hatîye ser dunyayê, wekû dibê ”mewlûd Birîfkan axirî” û herwiha dîyar kirîye, ku ew demekê li gundê Îtûtê jîyaye. Ev gund dikeve navbera bajêrê Dihûkê û gundê Birîfka, dema gûtîye ”Îtûte sakin muddetê”.

**Mî'irac name**

Seyidê muxtarê 'alem, serwera ewleda Adem
Ev 'hebîbû'llahe xatem, mehbe'tê nibûwwetê

Wî bi lef'za xûy mûbarek, şeri'ê xû kirye tedarek
Da xilas bikit bi carek, 'zulm û cewra ummetê

Guh bidin 'ebdê zelîle, rojekê ew Cibraîle
Hate nik nebîyê Xelîle, peykê rebbê 'îzzetê

Herduka mi'êrac bi şev bû, wê şevê 'tarî û xef bû
Mu's'tefa Quran ti dev bû, wê dixûnit ayetê

Cih li ser pişta bûraqê, qa'sidê we'slû telaqê
Mu's'tefa bû îştîyaqê, çun dikit muhîmmetê

'Erd û 'esman bû 'tewandin, zû li 'erşî wa'sîlandin
'Heq bi teşrîfê gihandin, da bibînit 'he'zretê

Merteba qewsî û qabê, esera fe'sil û xîtabê
'Hîkmeta 'îlm û kîtabê, 'heq bi teşrîfê detê

Herçî vîyayî hate kar, heq gûtne wî 'heştê hizar
'Heftê hizar sal buhar, paşî veger ba xeli'etê

B'çava dîbû wechê kerîm, dil dizanî şeinê 'e'zîm
Paşî li cennatûlne'îm, nazil t'bû wê sa'etê

Peykê Xudê bû Cibreîl, hatî bi fermana Celîl
Xûş şehreza û hem delîl, di gel d'hate cennetê

Cennet hemî wî se'h dikir, daim dikir 'hemd û şikir
Paşî cehnem qe'sid dikir, ew b'zanît heyietê

Dergeh bi yêk yêk se'h kirin, pêkve lehîb û agirin
J'hefta şeş bû kafirin, yadî cihê vê ummetê

Cihê ummeta muxtarî, her çi rîba û 'heramxwarî
Ehlê kebaîr biwarî, nehatye ser tûbetê

Herçê şefa'et bû nebê, li dunyayê bêtûbe bê
Xewfek l'qelbî da nebê, tirsa 'ezab û xeşyetê

roja diçîte me'hşerê, pencah hizar bi defterê
Sala d'bûrîn mehderê, nakit şefî'ê ummetê

Weqtê vegerya Mu's'tefa, ev 'hale bû me aşkira
'Zahir d'bin ehlê Xuda, me'ilûme ehlê şeqwetê

Hindî hene însan û cin, new'ek li ser dînî diçin
Ew laîqê re'hmê dibin, roja germîyê û 'hîrqetê

New'ê duwê di'zahirin, pêkve şeqî û kafirin
Ger ew l'ser kufrê mirin, qet nabînin çû re'hmetê

New'êsîyê misilmanin, ew 'zahirî bi îmanin
rojî û nivêj karê wanin, 'zahir d'bin be nîsbetê

Emma ba'tin ew kafirin, ew dê li ser kufrê mirin
Ew qencîyêt wan d'kirin, jê nagirin nef'îyetê

Herçî 'ebdê misilmane, şûla wî 'zulm û 'tu'xyane
Mu'eyyene yêk ji wane, ew kafire l'sekretê

Ya xaliqê qeyyûmê ’heq, Nûrî tu lêkey pir şefeq
Mes’ûd bitin weqtê sebeq, ya reb b’wî key şefqetê

Wekî kesek te nevîya, paşî tekellûf bû çîye
Tekellûfa munafiqye, me’ilûm tibî b’vê xe’sletê

Me’ilûm tibî her wê demê, fa’hiş tibî l’nik ’alemê
’Xemgîn di fikra wê ’xemê, xesran d’gel nedametê

Xwarîya qelb û zibanî, fe’hşîya ’eyba xudanî
Her kesek zû pê dizanî, bawerî kes pê netê

Nûn û waw ev înşakirî, zû zû ev beyt cemi’i kirî
Nis’het ji bûna sakirî, ’xafil nebin j’xilmetê

---

**Mehbe’t: xatem, dawî.**
**Nibûwwet: pê’xember.**
**Tedarek: rêxistin, beyan, amadekirin.**
**Peyk: qa’sid, nameber.**
**Boraq: hespê serê wî wek mirûva.**
**We’sl û telaq: bi yêk gehîştin û jêkvebûn.**
**’Tewandin: gihandin, geyandin.**
**Qews û qabî: (qabe qewseyn) ciheke kû di nav mî’iracnamê de hatiye gûtin wek perdekê di navbera Xwedê û Pê’xemberî de mabû.**
**Nazil: mebest li vir ”gehiştin, hatin” e.**
**Delîl: raber, rehnima.**
**Lehîb: bilêsey agir.**
**Kebaîr: gunehên pir mezin.**
**Şeqwet: ehlê şeqawet, derdî serî.**
**Ba’tin: nihênî, veşartî, sirrî.**
**Xe’sle: ’adet, rewişt, kirdar.**
**Nedamet: pûşmanî, peşîmanî, peşêmanî.**

**Gelî yar û birader**

Ey gelî yar û birader, guh bidin vê ni’s’hetê
Guh bidêrin cimle yêkser, werne rêka axretê

Werne ser rêka ’heqîqet, zîkrû ewradê ’terîqet
’Hûkim û burhan û şerî’et, da bigehne lezzetê

Qî’sekê ez dê beyankem, be’hsê mexlûqê zeman kem
Pîremêr û hem ciwan kem, da bizanin ’hîkmetê

Hindî kû însanê pîrin, ’sa’hibê ’hîr’sa kesîrin
Wê nebin texmîn û bîrin, wextê nez’ê sekretê

Sekreta şîdded kemale, naête fîkir û xeyale
Sa’eta dunya be’tale, da bikevne nî’imetê

Guh nedin nî’imeta fanî, ’serf bikin bû ’imrê canî
’Heyfe çu ’imrê ciwanî, tê nedîtbû lezzetê

Lezzeta darulfenaye, ’xefleta nefsa hewaye
Le’h’zeyek j’imrê wî maye, dê vexûtin şerbetê

Xelk û ehlê vî zemanî, tûbedarin bi ezmanî
Dilreşin şibhî qetranî, ew ji ber me’i’sîyetê

’Talibê malê ’heramin, tarikê fer’z û ’sîyamin
Dûjminê ehlê kîramin, ehlê tekî û mizgeftê

Tarikê ’sewm û ’selatin, mani’ê fi’trû zekatin
’Xafil bang û cema’atin, dûr ketin ji re’hmetê

Qanûn û rêk peyda kirîn, ’heşr û mîzan li bîr kirîn
Bertîlî wa peyda kirîn, heware rebbê ’îzzetê

’Talibê dinya mirarin, mûbtelayê kes û karin
Bê mejî û dîn û harin, da bigehne dewletê

Meclisa wan er’zek pîse, nadîye, cihek xebîse
Cihê şeytanê xebîse, wextê keyf û sû’hbetê

Sû’hbeta bey’i û şîraye, dexl û dan û çêl û gaye
Qûnterat û qellabaye, nakin tirsa qîyametê

Nîne wan tirsa xî’tabê, wextê d’çne nav tûrabê
Dê çawa din ew cewabê, cewaba rebbê ’îzzetê.

Dê çi kin l’nav çar dîwarî, meskenê dîpişk û marî,
Bê heval û teng û tarî, cihê ’hûzn û we’hşetê

Hindî lawin ew ’xûrûrin, tabi’î şeytanê kûrin
Fa’ilê fisq û ficûrin, dûrin ew ji tewbetê

’Eqil û fehma wan belave, qeswetî girtî hinave
’Her digêrin herdû çave, da xû pavên helketê

Ci’hêl û pîr nîne efkar, gûh bidin ayat û exbar
Da b’bînin Nebîyê mûxtar, wextê ’heyf û we’hşetê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 231

’Hûznîya bûçî wenakey, terka ewlad û birakey
Serser rew’za Mûstefakey, bibîye kûllê xizmetê

Sed selam û sed ’selat, ji Qadirê Mu’hyîlmemat
Ji bû Fexrûlkaînat, li hemû wext û sa’etê.

Ji hicreta xeyrûlenam, hizar û sêsed sal temam
Bîst û şeş jê be îkram, danana ne’zm û ni’s’hetê.

---

**Gûh bidêrin: gûh bidin, ragirin.**
**Zîkr û ewrad: di fikra Xwedê de mayîn.**
**Lezzet: xûşî û şadî.**
**’Hêr’sa kesîr: zûr agehdar.**
**Nez’ê sekretê: ’xer’xera rû’hê, cîyanela le katî seremergda.**
**Şîddet: zûr.**
**Nî’imeta fanî: mebest li vir ”dinya”ye.**
**Darûlfenai: dinya.**
**Qetran: reş (dermenekê reşe).**
**’Sîyam: rojî, rojîya.**
**Kîram: mezin, gewre.**
**’Selat: nivêj, nimêj, niwêj.**
**Mûbtela: tûşbûn, dûçar.**
**Er’z: erd.**
**Nadî: meyxane.**
**Mesken: mal, şiwên.**
**’Hûzn û we’hşet: ’xembar û tirs.**
**’Xûrûr: le xûbayîbûn.**
**Qeswet: sitem, zûlm.**
**Helket: mebest li vir ”heta derfetek ji xwera peyda dikin, ta hel û derfetêk peya bikin”.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 232

**Ni'sʼhet**

Ey gelî yar û birader, hûn guh bidin vê ni'sʼhetê
Ni'sʼheta min çêtire bû we, ji xezîna dewletê

Ev zeman axirzemane, qenc û 'sali'h tê ne man
Fisq û 'zulma ew li ser me, kefte be'hra 'zulmetê

Kur di gel babê neyare, dijmina dayê kiçe
Xizm û pismam ji 'tema'ê, nîne 'tama mu'hbetê

Mu'hbeta dînî 'xadena, ji bû me pîsîtîye
Nîne be'hsa şir'ê E'hmed, nîne tirsa axretê

Şir'û dîn li nik be'tal bû, mefsedî hate rawac
Lew kur û bab û biran, jêk nagirin umnîyetê

'Zalim û fasiq wekû hatîn hemû dê bêjne wî
Mer'heba ehlen we sehlen, 'sebr û bêhna me bi te tê

'Alim û 'sali'h wekû hatîn, enî l'wa d'bît girê
'Su'hbeta wan dê nexûş bît, pêkve jê t'ken nefretê

Millet û qewm û 'eşîran 'adeta xû j'bîr kirin
Şêx û sûfya û 'aliman hêlan silûka axretê

---

**Xezîne: gencîne, serwet û saman.**
**Mû'hbet: me'hebet, ji hev hezkirin.**
**'Xadena: nema, rûyî.**
**Mefsed: fasid, bedî, xirab.**
**Rawac: hate meydan.**
**Ûmnîyet: ûmêd.**
**Silûk: rewişt.**

**Ebû Bekirê Şîblî**

Ev bendehê şêxê cihan, lazim divê sirrê nihan
’Zahir bikim qu’tbê zeman, da hûn bizanin qî’setê

Şêxek hebû ’xewsê dinê, însan hemî jê bûn ’xenê
Nedihate xûwab û xurdinê, daim bi terka lezzetê

Navê ewî qu’tbê şerîf, şîblê Ebû Bekirê ’zerîf
Yêkser dibû wek mû’ze’îf, daim bi tirs û xeşyetê

E’slê ’terîqa şêx çîye, ewwel emîr û şahîye
Şêx ’hakimek farisîye, sul’tan û mîr û şewketê

Mîrê Nehawendê bû ew, şahê Semerqendê bû ew
’Ecem hemî dibendê ew, xûş xûş digêrit ’hîkmetê

Mîrê Nehawend û ’ecem, teşbîhê ’Hatem bakerem
Kes lê nebû endûh we’xem, ji ’edlû fe’zlû re’hmetê

Re’hmet hebû bê ’hed li nik, çendî mezin çendî kiçik
Bû kes nedhate kerb û rik, bi î’itîdal û ’tab’etê

Ew Şêx Ebû Bekir kû mîr, miskîn dile ’sa’hib feqîr
Tirsa Xudê daim li bîr, xelqû b’grîn jê ’îbretê

E’slû beyana qî’seyê, şêxê me şêxê caddeyê
Mîr bû bi textîû celweyê, roj bû li ser re’îyetê

Ev Şêx Ebû Bekirê şerîf, zêr dane miskîn û ze’îf
Fermanberî şahê le’tîf, qaim di emrê şîr’etê

Şêx bû xelîfê padişa, ya'inî şehir Be'xdadî ma
Qaîmeqam bû cayîgah, bû xatirê xîlafetê

Xûş dî ferman wezîr bû ew, wekîlek bê ne'zîr bû ew
Şah l'Be'xdad û emîr bû ew, ye'inî şahê mîlletê

Mîlletê îslamî nave, ew li dinyaê belave
Xûş mekan Be'xdadî nave, bû cihê 'sel'tanetê

Çunkî ew textê îmam bû, xulefai wecîhê meqam bû
Rehberê her xa's û 'am bû, der nî'zama şîretê

Şîreta mêra li wî bû, merteba pîra li wî bû
Quwweta şêra li wî bû, li nav erqa quwwetê

Quwweta daîrel'Îraq, serbiser îslamî tîfaq
Wekî benda xûş û rewaq, bû Medîn û Mekketê

Hêj Ebû Bekirê me mêr bû, xûş dî ferman û wezîr bû
Ew wezîrê şah kebîr bû, her kesek dê kit 'hacetê

Dinya hemî qe'sda wîye, mêr hemîya ew nasîye
Her sale ku ew mah nûye, mêrmete hate he'zretê

Mêrê Nehawend û 'ecem, ya'inî şahê 'alî 'elem
Be'xdad mûşerref kir qedem, bû dîtin û zîyaretê

Zîyareta baxuy fere, mîrê bê kûm û 'eskere
Dînê ji ferma çit dîre, lazim dibînit ze'hmetê

Qe'sda wezîrê şah dikir, dane beg pir rengmah dikir
'Alem bi xêr ew gah dikir, 'hîna kû hate ruiyetê

Çend mah li nik wezîr tima, bê 'hed menah û mal tida
Çû ser meqamê ewlîyai, 'safîyê 'sidqa nîyyetê

Ew Şêx Ebû Bekirê kebîr, hindî li nik wezîr û mîr
Kesdî wezîr nedhate bîr, biîxtîla'ta ûlfetê

rojekê wezîrê dî gû, ey şah Ebû Bekirê nekû
Şêxek heye xurşîde rû, qu'tbê cîhan û mûddetê

Qu'tbê zemanê ekbere, wi'llah îmamek re'hbere
Nav lê cuneyd û serwere, sul'tan û 'sa'hib xilmetê

Sul'tanê cinnû însîya, şehbazê 'erş û kursîya
Serbazî firaqudsîya, kes nîne jê kit wesfetê

Kes nîne wesfa şêxî b'dit, çavê ne'zer li şêxî b'kit
Can û dilan lê rê didit, mûştaqî nûra cebhetê

Mûştaqî nûra şibhê roj, ev şêx Cuneydê sînesûj
Ger lê nezer kit ehlê roj, dê b'çîte nehra cennetê

Wezîr û mîr vêkra diçûn, mûştaq û hem şeyda diçûn
Nêzîkî qu'tb wi'llah diçûn, haşa nebînit bereketê

Haşa nebînit sirrekê, cewher 'sedef ba durzekê
Şehbaz û şahîn qedrekê, kê dît dibînit 'heyretê

'Heyret mûrada salikî, îlqaa wechê halikî
Daim l'hezreta malikî, fanî di gel cem'îyetê

Mûrşidî neynik nimakir, can û dil vêkra cela kir
Bû Bekir pê mûbtela kir, 'eks rakîz cilwetê

’Eks û cilwa pehlewî kir, ’alema mexfî celî kir
Dî li cihê şah ’Elî kir, sîne têra cezbetê

Şah Ebû Bekirê mukerrem, gût wezîrî tuy mu’e’zem
Dîtina şêxê xû nadim ez bi milk û ’hîkmetê

Dest ji dunyaê verêstîn, ’heyfe em dunya perêstîn
Em ji ’tasa wê dimestîn, çake jêkin tewbetê

Dî şah Ebû Bekirî we kir, qe’sda ’terîqêû tewbê kir
Destê xû j’hikmetê vekir, dest havête ’terîqetê

Kinc û zeheb belav dikir, kûda ça perdarvî dikir
Çeşmê dixû pir av dikir, ji ber girîn û xeşyetê

Çû xîdmeta şêxîû digût, şêxim ’hebîb canim disût
’Işqate ru’ha min dixût, bû min ’eyanke xîdmetê

Şêx neynika rebbê mine, dilxûşîya qelbê mine
Xûş ’îbreta li bû mine, bû dil penahê ’îbretê

Xîdmeta şêx ixtîyarkit, sefera şêx pêve karkit
L’merkeba mecrî me barkit, dê qebûl kim ze’hmetê

Merkeba darûl beqaye, her wekî şêx dabîraye
Çar û çenka li wefaye, wenema kin ’xayetê

Tarac û ’hûrî ser bi ser, belkî dê li hûş û ciger
Vêkra hemî înane der, qet ixtîyarek jê netê

Qet min nemaye ’xîretek, wi’llah ne kar û sîretek
Rayek nemaye şîretek, ’heqqa nimûda me ji te tê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 237

Metbû'i tûyî, tabi'i ezim, bê ixtîyar û bê cezim
Weqtê tu lez key êbilezim, herçê rêya şêx têvetê

Şertê murîdî rastîye, şêxê îraded destîye
Hindî ku dil pê bîstîye, raste bi vê îradetê

Nabit murîd rayek hebit, fer'ze di şêxda berze bit
Da rûzena 'xeybê vebit, rûdet şihûda 'eybetê

Şêx dergevanê berzexê, destê li dergê dûzexê
Ke'ibîne ru'h berda rexê, wechê di 'eyna ke'ibetê

Şêx ke'ibeya qîbla mine, xûş neynika rebbê mine
Min ew bese, 'hesbê mine, ew çêtire j'bû qîbletê

Ser di fermana te kûye, dilberê emrê te hûye
Serbiser resma me çûye, resm û kar û meşyetê

'Heq waye, şêxim şemale, ya cemala zûlcelale
Nesxeya kîbrê çu xale, wa li nêva cebhetê

Cebheta wî şêxê şerîf, 'eksa xudawendê le'tîf
Wechê min mûwekê 'ze'îf, 'zahir tibû ji sûretê

Perda şihûdê raîye, 'hîna kû min şêx dîtîye
Yêkser wicûdim me'hwîye, fanî bûy ji şehadetê

Mecme'a be'hra 'heyatê, merkeba Mû'sa kûtatê
Yûşe'i û xizrî vetatê, 'talîne cem'îyetê

Cem'îyeta 'sa'hib dila, e'sl û wi'sûla wa'sila
Nabit temam û kamila, îlla bi cem'a we'sletê

We'sleta şêx û murîda, ferbû l'aqilû reşîda
Ey gelê qenc û se'îda, qenc bikin sem'îyetê

Şûlek heye tîfaqîye, şertê murîdî rastîye
We'ideyî di gel şêx gûtîye, fer'ze biçin b'kin xidmetê

'Sul'tan Cuneydê bê mîsal se'h kir ji bû Bekir sûal
Şêx gût tefeyyûq bû heval, daber cena'ha nisbetê

Ewwil te'serûf tê dikir, ba'tin 'sefandî çê dikir
Hêvnî û Kîmîya lê dikir, bûme dê şût ji 'xefletê

Avête bîrka kewserê, der kir birîn bi nişterê
Fikra dinê jê çû derê, dil kirye ba'xê cennetê

Ba'tin li ber şêx 'Zahire, ava 'heyatê lê kire
Yêkser bi lêvê 'tahire, şûştî ji hindî qe'swetê

Wê sa'etê agah têkir, dil avenabû mah dikir
Cihbû li xaneqahê kir, da ber çerxê rîya'zetê

'Teyrê ru'hî wek baz diçû, sakin berew evraz diçû
Sirra nihên a'xaz dibû, nakit we'ten vê cûssetê

Ev qalibê mislê qefes, sakin dibû j'rengê ceres
Qet naçinê mûr û meges, bihna 'ta'amê jê netê

Ferman dikir şêxê mezin, ev mûrşidê însan û cin
Sê sal temamî dê biçin, zîkrê celal bikêr tetê

Zikrê mewla xûş celaî, dîrin j'işq û 'sefayî
Nûra îşraq û 'zîyaî, karûbarê axretê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 239

Sê sal temam e'llah e'llah, daim digût her sal û mah
Ew şêx Ebû Bekirê ku şah, 'xafil nebû yek sa'etê

Zikrê Xudê sê sal digût, perda li ser canî di'sût
Çû j'ber dilî resm û ni'ût, yekta dibû we'hdanetê

Yekta bi fermana 'semed, pakîz bû ji kîbr û cesed
Bi (qul hûwe'llah û e'hed), neqş û nîgara ayetê

Neqşa li dil E'llah dîbû, sirrek 'eceb agah dîbû
Dil afete bû mah dîbû, sîrab ji xemra wehdetê

Fîkr û niqûş û hûş diçûn, têkel bi 'e'zim û le'hm û xûn
Zikrê Xudê têkel dibûn, rewşen dî lê 'îrfanetê

Sê sal diçûn ev reng hiner, taqî te da şêxî bi ser
Nîşan û xel'et pê vekir, 'sed deq ji libs û xel'etê

Sê sal, kû çûn 'taqî teda, paşî mekan saqî yeda
Ev reng 'terîqa mûrşida, carî dikin vê heyietê

Daim mûdam avkêşe ew, 'heblû seqay il pêşe ew
Delwê 'se'xîr teftîşe ew, rastî tigêrit xidmetê

Cemi'i kirin 'hebl û mesîn, ehlê 'îbadet hemnişîn
Hindî gût hatîn muslimîn, da pê b'grin 'teharetê

Sê sal bi vî 'halî biwar, bulbul û ebreq çar kinar
'Ucba û kîbra xû veşar, 'ucb û tekkebûr jê netê

Derman kirîn jêra birîn, vêra nema cûziek rengîn
Çak fehm b'kin ya ehlê dîn, nefsê bidin ber ze'hmetê

Nefsa we ba'tin cewhere, lakin qesawet dakire
'Sûtin bi agirî fere, da aşkerakit 'sefwetê

Cewherê nefsê 'sefînin, perde bê 'hed 'ucbû kînin
Pîrdeya yêkser hilînin, da ku se'hkin zînnetê

Herkesê gencek 'ecîbe, nefs li ser mar û 'selîbe
Xuvîyan 'hucba reqîbe, qufl û mîfte'h naketê

Terka wicûda wacîbe, da hûn bizanin 'hacîbe
Me'ibûd tewa'zu'i 'talîbe, pavên ji xû vê şirketê

Çendî ku me îşrak hebê, nabê ku me îdrak hebê
Pakîze canek pak hebê, dûre j'derba ehlîyetê

Ev rengî kir terka wicûd, der'hal tecella der şiyûd
Ser derûftad der sicûd, rabûn 'hîcabêt 'xefletê

We'hded di gel sirra semed, 'husna tecella ya e'hed
Rûn kir dil û can û cesed, pertew gehan vê muhcetê

Muhcet şemala hilgirî, kibrît şemi'a pê kirî
Lew'hê dilî cedwel kirî, neqqaş neqşa we'hdetê

'Heft sal biwarin salikî, îrşad ji destê malikî
Xûş xûş gihandin nasikî, 'sed 'enferî ji wê 'xîretê

'Sed 'enferî şêxê çeleng, însan heqîqet wek melek
Guhdarîya murşid gelek, çû merteba qu'tbîyetê

Murşidî çak pê dizanî, dewl û seqqa ya ku danî
Çûn j'bîrê fikra cihanî, kar û be'hsê memleketê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 241

Nefs herdem terwîc dikir, ru’h girtû pê tefrîc dikir
Nefsanîyê tefrîc dikir, j’hindî ’iyûb û xe’sletê

Dana li ser textê kemal, gehder meqam û zewq û ’hal
Geh nûş dikir ’tasa zelal, daim bi ’hal û cezbetê

Xidmeta ’sûfî û murîda, şêx gihand ’halê reşîda
Şêxe serdarê murîda, kar gihande ’xayetê

Paş kû avkêşan temam bû, şêx Cuneyd qu’tb îmam bû
Serwerê her xa’s û ’am bû, seyyîdê ’taîfetê

Xerqe û tekmîl îna wî di Ebû Bekir werîna
Guh bidin ey guşenişîna, hû dê berket xirqetê

Xirqe libsê ewlîyane, ’safî dilê e’sfîyane
Dûr ji qewê eşqîyane û ehlê kizb û bîd’etê

’Sûfîyê ’safî we nabit, sîne pir kîbr û rîya bit
Dê j’wan qewma cuda bit, dînfirûşê rûmetê

Şêxê Cuneyd xûş ’tebîbe, gût Ebû Bekir edîbe
Li me’tbexê sê sal dîbe, ji bû ’te’am û xidmetê

Bû Bekir sûfî û emîr bû, ’aşiqê guftarê pîr bû
Xadimê sûfî û feqîr bû, nakit ji wan qet nefretê

Dem bi dem kasik dişiştin, me’tbex û zembîl li piştin
Herdu kar vêkra gehiştin, kar digel siccadetê

Xidmet kû kirne sal temam, siccade dayêû kir îmam
Ev murşidê qaîmeqam rûnişte kûşê su’hbetê

Şêx Ebû Bekir wisakir, ’sed cefa nefs mubtelakir
Nakihatê ru’h ’sefakir, çu meqamê ’sefwetê

Ey gelî ’sûfî û feqîra, guh bidin guftarê pîra
Nis’hetê şêx û kebîra, qet nekin jê nefretê

Nis’hetê ’sa’hib şûnasa, rehberê ehlê qiyasa
’Heyfe têkin kêm û kasa, qenc bizanin ’hîkmetê

’Hîkmet û sirra ’terîqe, keştîya yecrî ’xerîqe
Kas û fincana re’hîqe, xatema mextûmetê

Xatema mulk û beqaê, her ku min destê xûdayê
Bê edeb hadir gihayê, nar û şu’ila ‘hîrqetê

Şêx Ebû Bekirê se’îde, ’hukkam û şêx û murîde
Ewwila karê reşîde, geşte ’halê ra’hetê

’Heft meqam yêkser biwarin, ’xe’sû te’hlîyî vexwarin
Nagihan şerbet bijarin, ’hal û zewqa şerbetê

Ewwil meqam emmarîye, nefsa murîd pê carîye
Şey’tan di gel hemmurîye, tew’hîd ji wê nefsîyetê

Nefsa hemî e’xyar bikit, barê rîya’zet bar bikit
Rûberderê cebbar bikit, yêkser hilînit hîmmetê

Yêkser bikit hîmmet ji dil, îsbat û nefya nûre ’zil
Înşah bikit wan mil bi mil, bane’zm û qewl û şîddetê

’Hetta nemînin ’xeyrî ’heq, tew’hîd ji dil bîtin neseq
Hem defi’i bin cûrm û ’eleq, fari’x fûadê wechetê

Sanî meqam lewwamîye, perda li nefsê xasîye
Namê celal xûş namîye, dilneqş e'llah wê ketê

Eynîyadil wekî sîrac, xûna dilî mislê uzcac
'Safî dîbû ji tûz û 'ecac, zikra celalê berqetê

Mî'sba'ha dil dagirtîye, şû'ila qewî jê rabîye
Perda dilî pê sûtîye, dil maye nûra şu'iletê

Hindî hebin sirr û 'hîcab, ru'hê hebin perda û nîqab
Wa lê hebin cewr û 'ezab, ixsîr di destê 'zulmetê

Ru'hê zîkir peyda diçû, dagîrt û lêda mû bi mû
Ru'ha murîd yêkta d'bû, dûr bû ji hindî 'xefletê

Salis meqam me mulhemî, îlham ji bû tên herdemî
Dûr bit ji narê cehnemî, ya'inî ji hindî şehwetê

Nefsa kû nav lê mulheme, sirra murîdî xurreme
Te'hqîq bizanin mu'hkeme, 'heq wirûde ji 'haletê

Mizgînîya 'ebdê 'efîf, sirra kû hem sirra le'tîf
Cezbate canê tê xefîf, der'hal nehavêt xîffetê

'Hakimê sirrî ku hate, 'zebi't kirin milk û wilate
Dewletê wechê xû da te, bakemala wechetê

Wê 'hikmetê her lê dikit, nûşîrwanî 'edlê dikit
Menzilgeha lê çê dikit, sul'tan ji dil darî detê

Dewrê didit sul'tanê 'hey, 'tebl û kewsera zewq û ney
Hem gûş û can kit ser ji mey, daxil bikit bin xîffetê

Da 'hey bibêt hem serqewî, hem ez sul'tan û pehlewî
Rûnit li 'erşê mustewî, vêkra bikin ulfîyetê

Rabi'i meqamê mu'tmein, em şehrezayê cadein
Îlla ismê 'hey me sîndin, wêrdate 'hey her muddetê

Ewwil ku serfanî tebûwa, bêhûş û nadanî te bûwa
Dilmay û 'heyranî tebûwa, hem 'xerq di be'hrê 'heyretê

Cemi'i ku ser dagir tebûwa, herdem li 'heq na'zir te bûwa
Muştaq ji 'işqê pîr tebûwa, kes dî nethate hizretê

Kes dî nethate ber dilî, 'herba ji roja gulgulî
Sûrgul mirada bulbilî, berqa şûhûdê vêketê

Fanîyê bê ferq û cemi'i, gûmrehîyê bê çeşm û semi'i
Rehberê bê nûr û şemi'i, qet nizanit heybetê

Salîkê kamilî nebûy, 'arifê wa'silî nebûy
Farq ji bû 'ha'silî nebûy, qence jêkim firqetê

Gerçê ew nûrînê dile, emma ne mûddek kamile
Hişyare emma 'xafile, îrşad ji wî îlla netê

Fer'ze kû se'hkî car û bên, da cewherî se'hkin ji 'ên
'Zahir bitin j'bû 'hîkmetên, xaliq digel xelqîyetê

Nagihan şahê le'tîfe, salikî dê kit xelîfe
'Hîkmeta textê şerîfe, ba'tinî 'heq dê detê

Me'ibûd çuma naçit ji bîr, mexlûq ji wî yêkser esîr
'Hikmê li ser şahê emîr, dê kit bi çav şefeqetê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 245

Salik tu qu'tbê 'alemî, qaîmeqamê Ademî
Ger çend tu 'sa'hib xatemî, êmin mebe j'ezlîyetê

Xamis meqamê ra'zîye, ra'zî bi emrê qa'zîye
Qaîm di fermana wîye, 'ezil nabit ji xîlafetê

Mîr dêdetê mulkî gelek, mulkîyeta êş û melek
Eq'tab û ebdalêt çeleng, vêkra da emrû 'ta'etê

Nefsa ku nav lê ra'zîye, qaîm di fermana wîye
Lew çu meqamê jûrîye, mexlûq di fermanê wetê

Şûla ku reb ixtîyar bikit, emrek li nefsê bar bikit
Nabit ku dil jê 'sar bikit, belkî bi kêf û me'hbetê

Ferman dikit rebbê mezin, milyaket û îns û wecin
Fer'ze li wî 'ebdê dimin, jêra bikin her xidmetê

Her xidmeta 'ebdî meken, bêkêyfîya wî qet meken
Çendî bivêtin her weken, î'hsan ji î'hsanê wetê

'Ebdê meyê 'ta'et kirî, 'ala bi destê xû birî
Ne'zma 'terîqê çê kirî, ew laîqe j'bû xilmetê

'Ala û reqsa serxûşin, qews û kivanê tûzreşin
Bêwan û dîn û mehweşin, tîrek tivê ket d'ewetê

Xeli'et û textê kemalî, salikê 'heddû wî'salî
De'iweya cam û cemalî, dê ber 'heydanî ketê

Salik mirîdek 'safîye, meq'sûd xû wechê baqîye
Mi'sba'hê dil nûranîye, dildaê qeyyûmetê

Herdem dibînit xêr û şer, er'z û sema û 'hişk û ter
Hem bad û avare kezer, yêk yêk di destê qudretê

Yêk yêk di destê xaliqî, gûmrah û karê 'sadiqî
Dilbenda 'işqa 'aşiqî, qeyyûm û li nefs nusxetê

Qeyyûm û nefsî macera, ez 'erşî ta te'htel sera
Mûhr û qelem girtin v'xûra, katib qelem da rûq'etê

Rûq'e çîye lew'hê ezel, gûftar û îclal û 'emel
Fikir neqil bûne di gel, îcad û mewcûdîyetê

Mewcûd di bin herdem çûnî, mewcûd bixû qeyyûmê 'hey
Leb têşneyê şehkaseyî, dev daye kasa neşietê

Qeyyûm divê dûrrdanebî, 'xafil ji qeyyûmî nebî
Da daxilî mer'zîyebî, ew xûş meqamê rûtbetê

Mer'zîye ew nefsa şeşe, salîk wekîlek pê xweşe
Raci'i tibin jêra hişe, baqî t'bin bû we'hdanetê

Salîk meqam mer'zîye bû, dest û sera me'twîye bû
Can û cesed meclîye bû, teşbîhê şîşa 'sefwetê

Ev 'arifê wê bê mîsal, ba'tin cemal û yek celal
Menzilgeha textê kemal, nêzîke dê pê xû detê

Bala diçû sirrê cela, ez firişta 'erşê 'ela
Perde 'elaîq mubtela, nakin ji dil cem'îyetê

We'hdeta kesret digel da, dil tecella bê xelel da
'Alema mexfî 'emel da, ru'hê çavî da kesretê

Kesreta ’heq ji ’eyan bit, wechê baqîyê rennan bit
Meşheda qu’tbê zeman bit, canî tecella vêketê

Meşheda ’eynûl yeqînê, ger bi ’heq bête kirînê
Dê bi ru’hdanê biçînê, da bizanîn qîmetê

’Husna zatê Zulcelalî, dil ji bû daim tinalî
Zerreyek zanî bi ’halî, kefte aha ‘hîrqetê

Ru’ha ku dî ’heqqûl yeqîn, keşfa şihûdê jê tedîn
Narê kewazdî pê birîn, da’xa dilî kul vêketê

Da’xa dilê tihnî çîye, ’husna tecella barîye
Yêk pertewa nûranîye, ’aşiq gehande cezbetê

Dî pertewî rakir ’hicab, dil jê tibû şibhê kebab
’Heta ku têt roja ’hesab, canî tecella jê netê

Dil ma di nav berqa şihûd, zatî teccella kir wicûd
Sana ru’hî serda sicûd, ’zahir d’bû ji her zerretê

Canî xilas kir giftûgû, fari’x di dunyayê tibû
Nêzîkî me’ibûdiş diçû, cûşek ji qurbê vêketê

Banî biwarî cemi’i ferq, guftarî ba teilîf û xerq
Gahê ji me’xrib geh ji şerq, înşah dikit vê qî’setê

Geh ji bala, geh ji jêre, geh birsine, gahê têre
Gahê rûve, gahê şêre, lêk tikêdet ’haletê

Geh ji ewwil, geh ji axir, geh ji ba’tin, geh ji ’zahir
Geh ji qanûn, geh ji nadir, geh ji ’ilmê ’hîkmetê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ  20/7/02  4:02 PM  Page 248

'Ilmê cihan û axirî, dil tercûmane b'zahirî
Sitra qelem 'zahir kirî, naête 'halê sûretê

'Hal û beyana roj û şev, sirra negûtî kes bi dev
Min gû qelem her jê birev, sirra nevêtin şuhretê

Hespî qelem kêşa celew, hişyarî sirrayê dî xew
Ev êdekê çestî bi dew, bîdare gîya 'xurbetê

Min gû qelem, ev dê çikey, vî 'eskerî dê kîve bey
Kûmîyetê nedihate 'hey, dê kim wekî ru'h vêketê

Der'hal qelem wî gûte min, dê keşf bikim sirrek mezin
Milyaket û însan û cin, herçê vekit vê nûsxetê

Esrar û 'hal û navê wan, şûla kû mexfî hem nihan
Ev qelem dê kitin 'eyan, esrar û 'halê xelqetê

E'hwal û nêzîk û be'îd, 'halê şaqîyû hem se'îd
We'sfa qedîm û hem cedîd, hem refteganê ummetê

Ez fewqê 'erş te'htel ferşî, dîwan text û kuçk û 'hewşî
Cennat me'irûşat û 'erşî, î'zhar bikim mahîyetê

Er munkerin, er mu'iteqid, er zêdekar û mu'iteqid
Er hest hîmmet û er mecid, îxbar bikim jê heyietê

Er qewlê 'sadiq er diru'x, ehlê 'terîq û ehlê 'tu'x
Mi'sba'h û canê dil firu'x, 'safîyû 'sidqa hîmmetê

Derwêş û şah tawenkera, hem serfiraz û rehbera
Mecnûnê bê dil ebtera, qelbî cemalek vêketê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 249

Te'ib û cefaya 'hacîya, diltengîya bê hîvîya
Bê îftîqara e'xnîya, ehlê 'sefa û ra'hetê

---

**Ev bendehê: ez li bendê me, min bendî ewim, min biçûkî ewim (dîyare di serdema Şêx Nûreddînî de li cihê peyva "ez" peyva "ev" hatîye bikaranîn).**
**Sirrê nihan: tiştên veşartî, nihênî, şarawe.**
**'Xenî: dewlemend, zengîn.**
**Xwab û xûrdin: razan û xwarin, xewtin û xwardin, xew û xûrak.**
**Lezzet: xûşî, şadî.**
**'Zerîf: ciwan, nasik, xûnşêrîn.**
**Nehawend: bajêreke nêzîkî Hemedanê, li Îranê.**
**Semerqend: bajêreke li Ûzbêkistanê.**
**'Hatem bakerem: ('hatem: 'hatemê 'taî), (bakerem: bexşende).**
**Endûh we'xem: derd û xem, xem û xefet.**
**Cilwe: xwe derxistin, xwenîşandan.**
**Ra'îyet: xelk, xelq.**
**Fermanber: muxlis.**
**Padişah: mîr, sûl'tan, 'hakim.**
**Şehir: bajêr, şar.**
**Mah: mang, hîv.**
**Caîgah: cih, cêga.**
**Bê ne'zîr: bê nimûne, bê hawta.**
**Rehber: raber, pêşewa.**
**'Hîna: dema, katî, wexta.**
**Menah: serwet û saman, daraî.**
**Xûrşîde rû: rûyê wek tavê.**
**Serwer: gewre, mezin.**
**Serbaz: leşker, esker.**
**Sînesûj: dil şewitî.**

**Nehir: rûbar, rûîbar.**
**Şeyda: aşiq.**
**Salik: rêbiwar, rêbirr.**
**Îlqai: dîdar.**
**Fanî: neman.**
**Nimakir: destnîşankir.**
**Celakir: Rûşinkirdnewe, rûhnkir.**
**Celî: aşkira, xûya, aşkera.**
**Sînetîr: tîrê di nav singî de simyay.**
**Çeşm: çav, çaw.**
**’Eyan: beyan, aşkira, aşkera.**
**Neynik: mirêk, awêne.**
**Merkeba mecrî: mebest li vir ”espe”.**
**Tarac: talankirin.**
**Jê netê: jê nayê, jê nayêt.**
**Sîret: rewişt.**
**Rayek: dengek.**
**Cezm: pêdagirtin li ser tiştekî.**
**Rûzen: rewzene.**
**Rûdet: rû didet, rû edat.**
**Dûzex: dûjeh, cehennem.**
**’Hesbê mine: xûşewîstê mine.**
**Cebhet: rû, rûy.**
**Xûdawent: xawen, sa’hib, xwedî, xudan.**
**Raîye: aşkiraye.**
**Me’hwî: neman.**
**Merkeb: mebest li vir ”esp”e.**
**Be’hra ’heyatê: derya jîyanê.**
**Xal: nîşan.**
**Tefeyûq: rêkeftin, rêkewtin, ittîfaqkirin.**
**Cena’h: teref, dese.**
**Bîrka kewserê: ava kewserê (avake li behiştê).**
**Nişter: cûrek çeke wek xencer, çeqoya sertîj, cûrê çeqûyî**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 251

nûktîje.
Dîl: ixsîr, esîr, hêsîr.
Xaniqah: cihê Xwedaperistîyê, şiwênî Xûwaperistî.
Çerxê riya’zet: dewranê peristîkirinê.
A’xaz dibû: aşkira dibû, aşkera ebû, derekew.
Cûsse: laş, leş.
Mûr û meges: mêrî û mêş, mûrî û mêş, mêrûlle û mêş.
Mah: heyv, hîv.
Yêkta: tak, tenya.
’Semed: bêniyaz.
Neqş û nîgar: mebest li vir ”ciwanî”ye.
’E’zm û le’him: hestî û gûşt.
Libs: cil, kinc, çek.
Xel’et: bexşîn.
Delwê ’se’xîr: setla biçûk, dewlika biçûk.
’Hebil: werîs, ben, kindir, gûrîs, tenaf.
Hemnişîn: hawnişîn.
Çarkinar: çargûşe, çarrex, çarla, çarteref, çaralî.
Bûwar: rabiwardin, jîyan.
’Ucib û kîn: riq û çîn, kerb û çîn.
’Selîb: xaç.
’Hûcib: ciwanî.
Pakîze: pak, pakij, xawên.
Tecella: aşkirabûn, derkewtin.
Derşîyûd: le şêwa.
’Hîcab: perde, pêçe.
Pertew: tîşk, rûnahî, nûr.
Çeleng: ciwan.
Qû’tbîyet: mezinî, gewreyî.
Ser derûftad: çû sicûdê, çûwe kirnûşewe.
Tefrîc: jêk veqetandin, ciyakirdinewe.
Geh: car, carna.
Nûş: xwardinewe, vexwarin.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 252

’Xayet: li vir (nîhayet, payan, kûtayî).
Xirqe: ’ebayeke şêx û mela li xwe dikin.
Gûşenişîn: tenêbûn, tenyanişîn, tenya jîyan.
Kizb: direw, dirû.
Gûftar: axiftin, qise.
Xadim: xulam, xizmetkar.
Nefret: le’inet.
Cefa: xem û xefet, bêwefayî.
Mûbtela: tûşbûn, dûçar.
Nakihat: şehewat.
Şûnas: nasîn.
Rûbeder: rûyê xwe dibe ber dergehê Xwedê, rûbedirga.
Fûad: dil, qelb.
Sirac: çira
Zûcac: cam, şîşe.
Nîqab: perde.
Yekta: tenya, bi tenê.
Mulhem: îlham pê gehiştî.
Xûrrem: şad, dilxweş.
Nûşîrwan: navê padişayekî ye, (enûşerewan).
Gûş: gûh, gûwê.
Tebwa: tu bûwe, te bûye.
Nadan: bê eqil.
Cam û cemalî: ciwanî.
Gûmrah: sergêj, ser lê şêwaw.
Herdem çûnî: kû tu çûy, ke çûyt.
Firişte: melayik, melayîket.
’Elaîq: nêzîkî.
Rennan: azad, aza.
Sana: asan.
Celew: cilewî.
Hest: heye.
Tawanker: xetaker.

**Firyadresî**

Ya reb tu firyadresî, 'xeyrî te min qet nîne kes
Em miflisê bê mal û pez, me'hrûm nebîn ji re'hmetê

Ya reb ji vê dunya xirab, em jê biçîn û bê 'hîsab
Dûr bîn ji daê pir 'ezab, ji ze'hmeta qîyametê

Ji ze'hmetê kû raşeqîn, têda bi 'sed ra'het biçîn
Muştaqî î'hsana teyîn, ya reb tu dûr key mi'hnetê

Xîtma me û 'imrê 'ezîz, nefsê di me pir bê temyîz
Nakir nebe bê çarê bîz, wextê diçîne axretê

Îman yeqîn te'hqîq dikî, î'hsan 'emel tewfîq dikî
Pê'xember û siddîq dikî, bi meq'seda xîyafetê

Ewwel tuyî, axir tuyî, hem na'sir û qadir tuyî
B'me ra'him û 'arif tuyî, î'hsan bikî me'xfîretê

Mu'htacî te ev Nûrî ye, her çend berah û 'a'sîye
Emma ku çav li kes nîye, îlla jiteû mer'hemetê

Amîn ji teû milyaketa, hem j'ehlê 'sa'hib 'hîmmeta
Nazil bikî 'sed re'hmeta, ji bû meû vê cema'etê

Ey muslîmat û muslimîn, ey muimînat û muimînîn
Ey 'salî'hat û 'sali'hîn, hîmmet bikin bi de'iwetê

Fatî'hê b'xûnin bû Nebî, paşî ji bû vî mûznibî
Re'hma Xudê l'gîyanê tebî, bikin 'ebdê Birîfkanî

---

**Firyadres: yarmetîder.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 254

**Şêxê Sifyanî** (*)

Min tivê 'halî beyan kim, eşkera sirrê 'eyan kim
Be'hsê vî qu'tbê zeman kim, tabi'în û ummetê

Ew Şêxê Sifyanê mezin, ew murşidê însan û cin
Melek ji bû nazil dibin, tête mekanê 'he'zretê

Me'idenê sirra îlahî, dûr ji mekirû her gunahî
Bû me xûş 'ewn û penahî, ji întî'zara sunnetê

Hindî dibûrîn roj û şev, daim girî nedihate xev
Baran dibarî her ji çev, ji 'tirs û lerz û heybetê

Ra'het nebû yêk sa'etê, 'xafil nebû ji 'ta'etê
Ji 'tirs û fikra axretê, bedbextîya 'aqîbetê

Ew 'hakimê textî cesed, hindî eda kit karê bed
Mu'hkem dibê lê bab û sed, pir 'xem di be'hra 'hesretê

'Hakim tivê 'adil bitin, da şûl bikam û dil bitin
Herçî vîya 'ha'sil bitin, êmin bitin j're'îyetê

Sul'tanîya dil daime, e'i'zai bi emrî qaime
Ger 'adil û wer 'zalime, 'hukmê dikit bi qûwetê

Ew rehberê wî 'eskerî, rû'h û cesed bû mişterî
An av delîlê agirî, anî dikêşne cennetê

'Hakim kû her 'zulmê bikit, emrê Xudê bi cîh nebit
Destê çepê ka'xez dibit, roja 'heşr û qîyametê

Rûreş dibîtin wê demê, hajûne babê cehnemê

Dê multeqabit be ’xemê, xalî ji lu’tf û re’hmetê

We’sîyeta min li we bit, da kes nêzîk ’zalim ne bit
Re’hmet ji bû wî da hebit, rûspî d’bîtin di axretê

Nêzîkîya wan jehre her, le’inet ji bala têne ser
Rast û duriste ev xeber, ne’sa ’hedîs û ayetê

’Zalim digel ’zalim dibin, ’hakim ligel ’hakim dibin
’Alim digel ’alim dibin, bi’itîbara ulfîyetê

Hemîya ji cem’a ewlîyai, dûre ji ehlê eşqîyai
Herçî te ew ji dil vîya, ew cînsekin be nîsbetê

---

**’Eyan: beyan, aşkira, xûya.**
**Penah: piştîwan.**
**E’i’zai: endam.**

(*) Ev helbesta bi navê ”Şêxê Sifyanî” xûya ye, kû bi dawî nehatîye, çûnke navê Nûrî di rêza dawî da nehatîye gûtin û herwiha pêveçûna vê helbestê di destxeta kû me dîtî li vê derê temam dibû, lê me dît, kû helbesta ”’Hakimê ’zûlmê bikit” berdewamîya vê helbestê ye û bi vê rêzê bi dawî tê:

**Ger têşneyê ’husna we tê, ger bû xûyê ger nexûyê**
**Ger ba’xevanê ba’xeyê, ba’xê seray ’îrfanetê.**

Û ji bû tunebûna destxeta helbesta ”’Hakimê ’zûlmê bikit” di dest minda li cihekî bi vî awayî min dîtîye û belkî hîn berdewamîya wê jî mabe.

Tevî helbestên di nav vê dîwanê de me bi nav kirin. Û ji bû tûnebûna destxetên hinek helbesta ji wan ”Beyta sekeratê”, ”Qenc û ewlîya”, ”Şêx û mirîd”, ”Gelî sûfî û feqîra”, ”Dil”, ”Hakimê zûlmê bikit”, ”Qenc û xirab”, ”Şah û mîr”, ”’Hemd û şûkûr”, ”Ehlê ’hi’zûrê”, ”Nûrî Birîfkî a’slê ew”, ”Şî’ira mûbarek”, ”Gelî yar û birader”, ”Nis’het”, ”Ebûbekirê Şiblî”, ”Şêxê Sifyanî” dibe kû hinek şaşî hebin, lê piştî hewldanek mezin û bi alîkarîya mamûstayên pispûr me bi vî awayî çap kir.

**Zahid Birîfkanî**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 256

# Rûba'îyat

## (Çarmalkîyên Şêx Nûreddînê Birîfkanî)

### (1) Çarmalkîya Şêx Nûreddînê Birîfkanî li ser helbesta Şêx E'hmedê Cizîrî

Serser bidame ba tac û hamet
Yek 'eşwe dame şahîn şehamet
'Er'er xerame bi qedd û qamet
Yek bûse da me ba 'sed qîyamet

Der bûseyê dîn min dad û îman
'Hetta verisitin hîvî ji ber can
Yek bûse da me ewwel bi î'hsan
Axir li min kir curm û 'xeramet

Der 'husnê berqê canên me sotin
Nakim çu ferqê nayête gotin
Ji jengê zerqê dilda bişûtin
Cama 'sedef beyn rend û keramet

Cama 'sedef beyn rindî bela xîz
Nabê ji wê kim wi'llahî perhîz
Ji herdu çeşman tê mestî xûnrîz
Nûra du çeşman kê dî selamet

Qelbê perîşan der 'husnê êşan
Reştûze nîşan tê 'helqe kêşan
Li derd û êşan peykan û nîşan
Me j'herdu çeşman kifşîn 'elamet

’Işqê kirîn ta bê fikir û ’hezbûm
Perwane şemi’ê aşifte lezbûm
Reswaî ’işqê ne teniha ez bûm
Kes dî zemanan ’hub bê melamet

’Hubba te nayê der be’hs û defter
Bilbil ji werdê ’heyran û ebter
Dû sûcde fer’zin fîl’hal bibeyn ber
Dema xuya bin ew qedd û qamet

Bê mirwet înkar ehlê ’înadê
Canê reqîbî cadir fesadê
Da ’eybê rindan nekî bebadê
(Nifûsû qewmîn bîha tesamet)

Hindî bimînit ’umrê te Nûrî
Bêhûde lazim pir bade xorî
Mela li ’umrê bêfeyda bûrî
Kuştina bizûran qehr û nedamet

---

**Şahîn: navê teyrekî ye.**
**Bûse: maç.**
**Cam: şîşe, pîyale.**
**Bîn: bibîn, bibîne.**
**Xîz: helsan, lê peydabûn, lê ebarêt.**
**Perhîz: dest jêhilgirtin, dûrkewtnewe, parêzî lê bikem.**
**Perwane: minminîk, pepûle, pelatînk, pelpelatînk.**
**Aşifte: perîşan, perêşan.**
**Reswa: bê abrû.**
**’Hûb: xûşewîstî, evînî, hezkirin.**
**Bêhûde: bê fayde, bê sûd.**

**(2) Çarmalkîya Şêx Nûreddînê Birîfkanî li ser helbesta Şêx E'hmedê Cizîrî**

Kafî min ji dilberê her mûjdeyê 'hîmayet
Yek nameyê zerfişan mektûbetê wîlayet
Ewwel kû yarê dame yek zerre yek 'înayet
Qismet me xemrû came di deftera hîdayet

Şehwarê şahê xanan {der behirê în} gedayan
Ba'tin bi lu'tf û î'h'san 'zahir tikit belayan
'Husnû cemalê canan nadêrîtin tu payan
Herçê nebît bîdayet e'slen nehîn nîhayet

Min dîne der bîdayet dilber li min dinêra
Yarê bi lu'tfû mînnet pir 'eşwe dî mevêra
Fêy'za 'ulûmê 'hîkmet cama 'sedef digêra
Me j'destê mu'xbeçan dît bimu's'hef û biayet

Geh cam û geh xirûşî hûşî medan dipûşî
Pîrê mu'xan ku nûşî dîtin 'sefa û xûşî
'Arif 'heta ne nûşî ji destê meyfirûşî
'Xaîb nebû ji hûşî peyda nekir wîlayet

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 259

Salik bi ’ilmî lew hat da kesb bikit ’sîbabat
Hindî hebit ’înayet ’seyyadê şêrê ’xabat
Gûnah û zenb û ’ta’xat hilnagirin xerabat
Kesê bi vê derî rit divê bikit rî’ayet

Dil girt û kilbitanî meczûb û ker bi kerkir
Hindî wicûd û hestî wi’llahî jê vederkir
’Işqê ji herdu çeşman ewwel di dil eserkir
Lê zere zere axir ’sotin kir û sîrayet

Sê’sed selam jimin da li şahê menzilîbit
Menzil gehate canim fer’ze te çavî lêbit
Şakî (el sîla’h) herdem bi kuştina Melê bit
Gazindeyan ji kê kim ji kê bikim şîkayet

Şiklê dinê ê ’tarî can û dilan dixûtin
Narê cemalê xûban bêşik hemî di’sotin
Cama di destê şahid jengê jidil dişûtin
Pîrê mu’xan ji rindan weh weh dikir rîwayet

Cama xezef di destî rindan kû ’sef dibestî
Yekser nemame hestî dil dî kû ’helqe bestî
E’twarî ’işq û mestî esrarî bit perestî
Teqrîr û ’sed rîwayet nakit libû kîfayet

’Hubba sîyahê xalan dinya û dîn dinexşit
Salik di xelwexanan canê şirîn dibexşit
Lîye’tmeînne qelbî ’eynûl yeqîn dibexşit
’Eynûl’eyan divêtin kafî nehin rîwayet

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 260

Nûrî ji dil tu şaî her çendî pir belaî
Dilbend û mehweşaî lew dînû mubtelaî
Mîrî û padişaî mûyek li nik Melaî
Nadim bi mulkê ’alem yek zerre yek ’înayet

---

**Mûjde: mizgînî.**
**Geda: sûwalker, perexwaz, derûzî.**
**Payan: dawî, kûtayî.**
**Nehîn: tûne, nîyetî.**
**’Işwe: naz û ciwanî.**
**Mû’xbeçan (pêşeway ayînî Zerdeşt).**
**Xirûş: hewar û nalîn.**
**Pîrê Mû’xan: zanayê Zerdeştî.**
**’Seyyad: nêçîrvan, rawker.**
**Xerabat: meyxane.**
**Çeşm: çav, çaw.**
**Sîrayet: teisîr kird, şwênî dana, têper bû.**
**Nar: agir.**
**Xûban: ciwan, layiq.**
**Cam: pîyale, şûşe.**
**Peristî: peristin, ’îbadetkirin.**
**Sîyahê xalan: xalên reş, nîşanên reş.**
**Bexişt: pêşkêşkirin, pêşkeşkirdin.**
**Mehweşai: rûyê te wek hîvê ye, wênet wekû mang waye.**

## (3) Çarmalkîya Şêx Nûreddînê Birîfkanî li ser helbesta Şêx E'hmedê Cizîrî

Şeh bi re'hmet nebitin çakeşîya dê çikit
Bi xû layiq nebitin 'hîkmetê Şeddadî çikit
Kes bi dadame nepirsît gîleh û dadî çikit
Te nebit dad û resek bêhûde Ferhadî çikit

Qûwet û karê nehin gerkû ne'sîbê mirîbit
Kî bi yarê digehit destê îradet lê nebit
Bi şirînî negihit destî eger Rûstemîbit
Dê bi bazûyê milan şibhetî Ferhadî çikit

Ji ezel qismet û emed we ne'sîba mabit
Da silûka meneseq bît û muwafiqî rabit
Fa'ilek lazime da fi'il û eser peydabit
Ger tu 'heddadî nebî kûreyê 'heddadî çikit

Bi çi rengî kesê bê we'slî dibê wa'silîbit
Ji hemî gûmrehî û dilê reşîyê fa'silbit
Mumkînek dê hebitin da ku 'teleb 'ha'silbibit
'Seyd û nêçîr ku nebit tûleyê 'seyyadî çikit

Te se'adet nebitin rojî ezel 'hukmê qedîm
Biçi wechî digirit ru'hê evî 'e'zmê remîm
Her gil û seng dibitin zêrre bi tedbîrê 'hekîm
Qabilîyet kû nebit 'hîkmetê ûstadî çikit

Ma dibit zêrê şibît 'sedmetê 'hekkakî nebit
Lê divê cewherê ser bêdil û îdrakî nebit
Kan bi gewher diçikit, gewher eger pakî nebit
Tûbe'sîret ku nebit sîretê ecdadî çikit

Çi mûberra'sid ji her neq'sê 'iyûban 'haşa
Heye 'xaib ji dinê 'işwe kû cûyan 'haşa
Zêr û zîwer dikirin celbê qulûban 'haşa
'Husnû pir zatî nebit qametê meyyadî çikit

Were ya 'husnê 'hebîban dilî yek celwedeyê
Ji cemalê hey hey bikire tu yek badeteyê
'Aşiqê mestî bi 'işqê nîye 'hacet be meyê
Waridê warid û e'hwalî biewradî çikit

Erte belqîsî hebit lazim dê hud hudîbit
Ji siba bêt û bitin nameyê na mûl'hedîbit
Te 'xere'z fikre keta yêk û liyêk mûrşidîbit
Salikê 'talibê îrşadê be Be'xdadî çikit

'Teleb û cuhd û eser dil ji ewan textî kehin
Çi esîrin ku cesed destî li ser destî nehin
Cuhde û se'îû 'teleb bê eserek 'safî nehin
Tu nebê perdenişîn çaker û qewwadî çikit

’Hub nebê se’î û ’teleb cumle bi xû ’eynî serab
Da binûşîn bi dilê badeyê engûrî şerab
Çi eser dî li berî xare bikit qe’treyê ab
Qelemê ma bidusê qe’treyê zuhha diçikit

Bi xuşû’ê û rikû’ê vedibit qelbê cela
Were Nûrî heme bûrîn li me xûşî û bela
Dê ji ’heq cazibîyek dil bigirit werne Mela
Ji ezel gerte bîdayet nebit îrşadî çikit.

---

**Şeh: şah, melik, sûl’tan, ’hakim.**
**Dad: hawar, firyad.**
**Gîleh: gileyî.**
**Bêhûde: bê sûd, bê fayde.**
**Bazû: mil, bask.**
**Gûmrehî: rê windakirin, rêga lê winbûn.**
**Gil: ax, xak.**
**Seng: ber, berd.**
**Gewher: altûn, zêr û zîv (tiştên giranbûha).**
**Mûberra: bê ’eyb, pak (mûberrasit: bê ’eybe, bê qusîre).**
**’Eşwe: naz û ciwanî.**
**Cûyan: geryan, taqîbkirdin, geran.**
**Zîwer: zêr û zîv.**
**Qamet: bejin û bala.**
**Cilwe: xwe nîşandan.**
**Ewrad: wird û du`a.**
**Kehin: ke heye, kû heye.**
**Nehin: nîye, tûneye, nîne.**
**Çaker: nûker, xizmetkar, xûlam.**

# Texmîsat

## Pêncmalkîyên Şêx Nûreddînê Birîfkanî

**(1)Pêncmalkîya Şêx Nûreddînê Birîfkanî li ser helbesta bapîrê xwe yê çarê Şêx Şemseddînê (El-Qu'tb el-Xelawatî) yê Exlatî yê Birîfkanî**

Dernexistîne te bazûyê sîmîn li me mişt
Di qîdemda ji di qewsên te li dil da me gehişt
Ciger û sîne 'eceb, semtine tîr û rim û xişt
Derdê 'işqê weh li min, rojî ezel kir ser nivişt
Her ji hingê dilê kul bûye, çu biryanê birişt

Bese qismet ji dinê, kakûlê reştûzê 'semed
Gul û nesrînê zûcacî, qede'h û camê cemed
Me kû nûşî ji meyê we'hdedê e'llah û e'hed
Ev dilê kul soz û derdî ji te besin ta ebed
Nemitvê 'hûr û qi'sûr û cumle lezzatê behişt

Qet 'eceb nîne ji min 'zahir bibin pir mu'icîzat
Qu'tbê 'ialem bîn û dil deryayê 'iîrfan der sûbat
Sirr elem neşre'h ji bû qelbê meyê 'xemgînî hat
Hûn mebên kev derde evrû, raste dilmê kul xelat
Evhe mîras hate bal'min qern be qern û pişt be pişt

Dilberim ev cerge têkda bûye biryan û kebab
Em kirîn meytê li ser textî, ne guftar û cewab
Mî'hneta 'işqate cana dil kire be'hrê 'ebab
Derd û 'işq herdu cemabûn hatne ser dilmê xerab
Lew perrat ev dil ke hingaft hem bi şîr û hem bi xişt

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 265

Der ’telebkarî te ser sewda û dil haim bikim
Xidmetek bê ’xiş li bû me’hbûbê her qaim tikim
Roj û şev çeşmê me xew nayê û xew ’saim tikim
’Talibê dîdarê yarim cûstû cû daim tikim
Ger xerabatest û mescid wer çi ke’hbest û kenîşt

Min ji meq’sûda tinê her dil miradek jê dixwest
Pir ’zeîf bû min ji cûstû cû dilber, can û post
Şukur lîllahî ’xemê te’hl, min ji ber rabûn çost
Her ji hingê wer kû bûyîm, aşnayê derdê dost
Terkîyan xûm kirdî her kez, lê nevêtim mal û çişt

Dîsa ava bû li min ev malê gûristanê dil
Hicrê dîdarî ruhabû mahê tabistanê dil
Cur’eyek badî vexwarim pê vejî mestanê dil
Leşkerê ’işqê ’elem îna ve şehristanê dil
’Xaret kir ehlê şehir çendkêk dibûn hûr û dirişt

E’hsene’llah çû jivê meydanê dil cewra reqîb
Qismetek bê’hed giha min we’slê dîdarê ’tebîb
Geh ji we’slê, geh ji hicrê xûş mirad bû xûş ne’sîb
Çindikê ez b’girîm j’soz û derdê hicranê ’hebîb
Her ke pêjabû l’gîyanim êstiranim cumle şişt

’Heyfe salik der ’terîqa dilberan kahil bibî
Dê b’gîyandanê xudan bext bî, û hem wa’sil bibî
Can bişû ba lîfê ’işqê, belkî jê ’ha’sil bibî
Gotim ey dil qet nebî carek ji wê ’xafil bibî
Nûke bêşik hest ’xeflet lal di destê fe’ilê zişt

Qet ji ’xeyrî zîkrê dilber min nema bît întî’zar
Ta li min kivnî dipêçin ez li ser textî şiwar
Dil birîndarê te cana, xûş di fikrit bî qerar
Me’hwî nabîtin li ber dilmê xerabim neqşîyar
Takê mesken qebir û balînim bibîtin berdê hişt

Ah min dersîne bê’hed mi’hnet û ’xem lê ceman
Ey nikû karim ’hebîba dil me deryayê ’xeman
Lû’tf û î’hsana te Nûrî daîmen hestî guman
Ta vikengî mûnte’zirbim ’sebir û taqet min neman
Ey ’hebîba wey li min kev xelwetît yêkcarî kuşt.

---

**Bazû: bal, qûl, bask.**
**Sîmîn: zîvîn, zîwîn, sipî, zîv.**
**Mişt: mist, pencelêkinraw, lêwawlêw.**
**Semtin: simandin, kûnkird.**
**Xişt: cûrek çeke wek xencerê, çeqûyî nûktîj.**
**Kakûl: perçem, fir.**
**’Semed: bênîyaz.**
**Di qedîmda: ji kevin da, ji berê da, le mêjewe.**
**Reştûz: rengreş, cûrekî tîrêye.**
**Camê cemed: qedeha kû Cemşîd paşayê Îranê şerab pê vexwerî, pîyaley Şah Cemşîd.**
**Derya: be’hir.**
**Der sûbat: bê ’hereke, sabit.**
**Gûftar: axiftin û peyivîn, qisekirdin, gûtin.**
**Cewab: bersîvdan.**
**Elem neşre’h: îşarete bû ayeteke Quranê.**
**Biryan: sûhtî û şewitî.**
**Meytê: mirîyê, mirdûyê.**

’Ebab: mewc, pêl, şepûldar.
Dil haim: dil sergerdan.
Qaim: daim, ’hazir.
Çeşm: çav, çaw.
’Saim: bi rojî, be rojû.
Cûstû cû: te’iqîb, pirsyarkirin, geran be diwey şitêk.
Post: pîst, pêst, post.
Çûst: bilez, çûst û çalak, zû.
Mahêtabistan: (mah: mang, heyv, hîv, qemer),
(tabistan: havîn, hawên).
Cûr’e: firek, qûrçek, qûmek, qûmêk.
Mestan: serxoş.
Cewra reqîb: azarî reqîb, êşanê reqîb.
Hicran: dûrî û bi tenêbûn, fîraq.
Salik: rêbir, rêbwar, mûsafir.
Kahil: pîr, kal, pîrd, bêhêz.
Lîf: lîfe, lîfk, lifke.
Gîyandanê: canfîdayê, xû fîdakirin, xû gûrîkirin.
Min nema bît întî’zar: çawerwan nakem, min hîç daxazîyên din tûnene, ez nema bimînim li bendê.
Kivnî: kifnê mirinê, kefen.
Textî şûwar: tateşûr, kevir û textê mirîya li ser dişûn.
Î’hsan: çakî û başî, karên qenc.
Hestî: saman û serwet.
Gûman: şik.
Nûrî: naznavê şi’êrî yê Şêx Nûreddînê Birîfkanî ye.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 268

**(2) Pêncmalkîya Şêx Nûreddînê Birîfkanî li ser helbesta Şêx E’hmedê Cizîrî**

Iksîrê cemala te ji dil reng û ’seda girt
Wê ’husnû cemalê ji xû ra sîne xûca girt
Lew cewherê ’işqa me ji dil ta ser û pa girt
Qelbê me şibhî zêr û ji fey’zate cela girt
Ma rû sîyeh û ’sifrî ’sîfet rengê ’sefagirt

Ayîneyê dil girtine ’sed cilwe ji berqê
Saqî ji ’sefa daneme ’sed cameyê zewqê
’Hetta kû me ’sotin dil û can herdu bi şewqê
Teşbîhê cesed dil me dinêv ateşê ’işqê
Dê qelb û ’heqîqet bit û iksîrê homagirt

Dil fer’ze bibit qelbê di e’twarê ’terîqet
Tew’hîd û fena hem biritin rahê şerî’et
Enware ji dil qencî bibin we’sfê ’tebî’et
Salik kî ye hatî ji mecazî bi ’heqîqet
’Soret neşûnasî û bi me’ina te fenagirt

Rehrayê silûkî ji beqaê ku ’sebeq da
Nûrek ji wî’salê wekû dî sîrr û neseq da
’Tavê li dinê da ji cebîna bûreqî da
Tenhane li me lami’î ’husna te şefeq da
’Alem bi xû wê ’husnû cemalê di xudagirt

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 269

Dagirtine mîrê felekê lûme diwî zal
Hindî dinêvîsî li kitabê ji mera qal
'Ha'zirî ji te ra 'alemî ser şibî go pal
Tey'xûnî di destê te zehî dewlet û îqbal
Her çi te bi wê ramê di tora xû humagirt

Carek tu bibîn derdilê mehcûr û kedayî
Reştûzeyê qewsîye li mêlakê gehayî
Ev bext û miradame ji dîdare sîyayî
Canê xwe mekir dane di dama kû vedayî
Ahû 'sîfet ew pê'hisîya rahî xe'tagirt

Ahû 'sîfeta 'xunçeleb û qamet û 'er'er
Şeb kakûlê 'se'hna cebehê camî Sikender
Naête çu qurran û şûbakan zerîya zer
'Enqa ne şikara ke dava tu biçîn ver
Dava ku li 'enqa tu vedî baz û hewagirt

Roja ezelî qelp me kir zulfê te şehamat
Nûşî me ji badê ku emîn pîrê xerabat
Hişyarî 'xaîbet ku li meyxaneyê heyhat
Her kes se'herê 'talibê tiştek bi çimen hat
Hin sosin û hin sinbil û hin zulfê dutagirt

Xûş qi'smete xûş 'tali'e lew bextê ne'sîbî
Dewra me û saqî me bixû destê 'tebîbî
Aha û firyadî çira dê jê dilî bî
Destê me se'her girt û birîn seyrî 'hebîbî
Fîl'halî reqîbî ji 'hesed lerze û ta girt

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:02 PM Page 270

'Hîna wekû 'teyrî me ji keyfê qûqû hat
Xûrrem nedema cewrû cefayate li dûr hat
'Hetta ku li bextê me sîyahî bisehû hat
Ew kebkê xeramat ku di kozê liqebû hat
Şahînê qe'zayê bi te'xafil ji xew ragirt

'Sed neqşê li nesrîne kişandîne li ser wê
Ustadê welî perde gîyan perde liber wê
Herçî kû didî qet ne dibû dewr û qeder wê
Zînhare kesê destî bibit erqemî ser wê
Bê 'işweyê le'ilan te biteslîmî jîhagirt

Canî xû fidakir du salî û liserda
'Xunçên di 'hebîbî ji mera nûşî biqerda
Wek tûleyê dergahî me 'imrê xû jiberda
'Sebrê berî şîrîne weh ustadî xeberda
Lew dil me bi te'hlî û 'xeman xurrem û şa girt

Çala wekû Yûsif ji xûra xelwe çi hilda
Hemrazê ewîn lew tişifayê dilê kulda
Emma ji hilalên te di qewsên te ji milda
Her niştər û şewkên kû 'hebîbê me li dilda
Min yek be yek û têk li derdê xwe şifa girt

Derdê me şifa girt û me dil 'helqeyê şebkir
'Sebrê me nema lew me ji wê biyek edebkir
Kirmance dinûşît dema qe'sdê 'erebîkir
'Aşiq ji 'xemê sayeyê wê camê 'telebkir
Pir 'eqlî didêrit me ji qismê 'hukemagirt

Sîmîn seqerê pir dûş û xûnrêzê zimanan
Penca digehînin dilû mêlak û cinanan
Ey şahê şahan leb şekir û qend û zibanan
’Sef’sef ne tinê gezme dibarin ji kivanan
Dil kakûlê zulfa ji kemendî bitebagirt

Hindî heyîm ez têşne dilê zulfê kemendî
Sîmîn zeqin û xal û xe’tê gerden û zendî
Perwaneyê ’husnê û liser ’teb’ê semendî
Dêwane herî dîne divê silsile bendî
Kû muste’heqî xusrewî xûban bicezagirt

Xûban bi çira girt û çeşa zehrê helahil
Me dihûşî dema ta bi ebed şibhetî bilbil
Kelcuhreyê ’sotin li me ev can û dilê kul
Pêyweste dû fêris ji mera daberizîn dil
Zûlfan ku çep û rastî laû’xîlme cemagirt

Pêyweste du fêris ji mera kerb û ’hesed bit
Nişter ji ewan der dilê kul ta bi ebed bit
Hey hey ji kivanê te me kir sirrê ’semed bit
Qewsê du hîlalan kû liser bûrcê esed bit
Bû şuhre di’amî ’emel engûşt nimagirt

Nûrî te dizanim ji evê çihreyî qirmiz
’Sed ah û fi’xanim ji kul û sinbil û nêrgiz
Zanim ji te abade kuda ’xunçeleba miz
Şi’ira te Mela ’sî’hrê şekir zêre bi mu’iciz
Zanim ji lebê le’ilê te ev lef’z û edagirt

---

**Iksîr: cewhereke kû mahîyeta cisma digûhre. Cewherêk ke mahîyetî ecsam degurê, bo nimûne (cîwe dekate zêw) (mis dekate zêr).**